



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 48

Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû? (beşê yekem) Goçkirina Îbrahîm bo Erdê Ken'an

Emê li jêr bi kurtahî jînenîgariya pêximber Îbrahîm wek ku di Tewratê da hatiye bînin ber çavan


Ji Ûr heya Êranê:

Navê Îbrahîm bi zimanê îbranî "*Ebram kurê Tareh*"e (أبرام بن تارح) û du birayên wî hene "*Naḥûr*" (ناحور) û "*Haran*". koka malbatê vedigere ser *Sam kurê Nûh* (شوح) û ev malbat li Ûra Keldanan, li başûrê Îraqê rûdinişt. Li wir *Ebram* bi *Sarayê* ra şû bûbû (zewicî bû). Li gor gotûbêjekê *Saray* xwişkê wî ji bavê da bû, yanê ne ji dêya wî bû, û li gor gotûbêjeka din ew keça birayê wî bû. Birayê wî *Haran* li Ûra Keldanan mir û kurê wî *Lot* li ba bavpîrê xwe *Tareh* ma û perwerde bû.

Tareh bi malbata xwe va ji Ûra Keldanan goç kir û çû bajarê Êran (Êran niha li bakurê Kurdistanê ye) û *Tareh* li Êranê wexer kir (mir). Dema ku jiyê (temen, umir) *Ebram* bû 75 sal, Xweda ferman da wî ku ji Êran goç bike û bi başûr da here erdê Ken'an (كنعان) (paşê nav bû Filestîn). Di Tewratê da hatiye: "û jêra got: **Ji erdê xwe, ji êla xwe û ji mala bavê xwe here wî erdê ku ez şanî te dikim; ezê te bikim neteweyeka payebilind û te pîroz bikim**"¹.

Ji Êran bo erdê Ken'an:

Ebram fermana Xweda pêkanî û bi kebanîya xwe *Saray* û kurê birayê xwe *Lot* ra goç kirin. Bi xwe ra koleyên xwe û milk û samanê xwe jî birin û berê xwe dan başûr, erdê Ken'an. Li bajarê *Şekîm* bi cih û war bûn (navê niha Nablûse û li bakurê dewleta Îsraîl ya niha dikeve). Xweda ji *Ebram* va xuya bû û jêra got: "**Ez vî erdî ji tovê te ra** (ji senseleta te ra) **didim**"². Û êdî *Ebram* hin bi hin ber bi başûr va goç kir heya gihîşt "*Beyt Îl*" li bakurê *Ûrşelaym* (paşê bû Qudis). Li her cihê ku lê dima, warek ji bo perestîna û ji bo pêşkêşkirina qurbanan ji Xweda ra avadikir.



Goça bo Misirê:

Di pey ra baran nebariya, hişkî çêbû û xela pêkhat, *Ebram* bi malbata xwe û kurê birayê xwe Lot ra çû Misirê. Pêş ku têkevin sînore Misirê, *Ebram* ji *Sarayê* xwast ku li pêş karmendên Misiriyan li ser sînor bêje ku ew xwîşka wî ye, daku Misirî çav bernedin xweşikbûn û bedewiya wê û wî nekujin. *Sarayê* daxwaza *Ebram* bi cih anî û dema ku mezinên karmendên Misiriyan bedewiya wê dîtin lê mat man. Rabûn Fer'ewn (فرعون) agahdar kirin. Fer'ewn ferman da ku wê bibin qesra wî. Ji van gotinan tê fêhmkirin ku ew kire jina xwe. Pir xelat û diyarî jî dan *Ebram* (kole, carî, mîh, gah, ker û hêştir). Lê belê bobelat hatin serê Fer'ewn û malbata wî, û naskir ku *Saray* di rastiye da jina *Ebrame*; lome û gazin ji *Ebram* kirin ji ber ku rastî veşartîye. *Saray* jêra vegerand û jê xwast ku milk û samanê xwe bibe û ji Misirê derkeve. Ferman da karmendên xwe ku vê malbatê di rêwîtiya derketinê da ji Misirê biparêzin³.

Vegera ji Misirê:

Ebram bi malbata xwe va li gel kurê birayê xwe *Lot* vegeriya başûrê erdê Ken'an. Ew êdî bûbû yek ji mezinên dewlemendan bi sewal, kole, zîv û zêr bûbû. Ew bi bakur da çû warê rûniştina xwe ya berê li (*Beyt Îl*). Pez û sewalên *Ebram* û *Lot* pir bûn û şivanên wan li ser mêrg û kaniyên avê şerê hev kirin. *Ebram* dît ku ya here baş ewe, ew ji hevdû cuda bibin. *Lot* bi keriyên pezê xwe va çû, û li erdê "*Sedûm*" li rojhilatê çemê Urdin bi cih bû. Berê ew herêm berhemdar û têrav bû, lê paşê ew kavil bû û rûniştivanên wir mirovên şerxwaz bûn.

Ebram li erdê Ken'an yê berhemdar ma. Xweda jêva xuyabû û jêra got: "**Serê xwe rake û li cihê ku lê yî, bi bakur da, bi başûr da, bi rojhilat da û bi rojava da binêre. Ji ber ku ev hemû erdê tu dibînî ez didim te û senseleta te, ta bi hemdem û ez senseleta te wek axê pir dikim**"⁴. Di dawiyê da *Ebram* li nêziya bajarê "*Êbrût*" (حَبْرُوت) ku li başûrê "*Ûrşelaym*" e û li rojavayê Derya Xoyê (Derya Mirî) (البحر المئت) ye bi cih bû. Li wir gorîgehek (qurbangehek) ji bo Xweda avakir û li wir hevpeymanek li gel sê serekan lidarxist.

Şerekî herêmi:

Di wê demê da şerek di navbera du hevpeymanan da pêkhat: Hevpeymanana yekem rojhilatî bû, çar padîşahan rêveberiya wê dikir. Di nav wan da padîşahê *Şin'ar* (شِنْعَار) (başûrê Îraqê) û padîşahê *Îlam* (Élam) (عِيلَام) , û padîşahê Îlam yê bihêztir bû. Hevpeymanana duwem rojavayî bû, bi rêveberiya pênc padîşahan ji erdê Ken'an û derdorên wî li Urdina niha.

Ev şer li nêziya Derya Xoyê (Derya Mirî) pêkhat û hevpeymanana rojavayî di şer da şikest. Hevpeymanana rojhilatî herêma ji başûrê Sûriya niha heya bi çiyayê *Se'îr* (سَعِير) (warê Hûriyan) û beriya *Faran* (erdê dêwan (عَمَالِقَة)) li başûrê Filestînê) xiste bin desthilata xwe. Malbata *Lot*, milk û samanê wî tev kete destê padîşahên hevpeymanana rojhilatî. *Ebram* rabû bi hevpeymanên xwe va êrişeka dijber destpêkirin û dan pey yê serkeftî heya bi bakurê Şamê. *Lot* û malbata wî rizgar kirin û samanê wan jî vegerand.

Piştî biserketina li dijî hevpeymanana rojhilatî êdî asta *Ebram* di erdê Ken'an da bilind bû û padîşahan ew spas kir û pesna wî dan. Di nav wan da "*Melkî Sadiq*" (مَلِكِي صَادِق) padîşahê "*Şalîm*" bû. *Ebram* ji hêla xwe va dehane (1/10) ji qezencên şer ku wergirtibûn da "*Melkî Sadiq*" û "*Melkî Sadiq*" ew pîroz kir⁵.

Piştî serkeftinê Xweda ji *Ebram* va xuya bû û soz da wî ku hemû erdê navbera çemê Nîl li hêla rojava û çemê Ferat li hêla rojhilat ji wî û senseleta wî ra be; û jêra got: "**Ji senseleta te ra ez vî erdî didim, ji çemê Misirê heya bi çemê mezin, çemê Ferat**"⁶.

Jidayîkbûna Îsmail:

Herku hêza *Ebram* ya aborî û siyasî bêhtir dibû, Xweda erdekî hên firehtir dida wî. Lê belê, pirsgirêka wî ew bû ku kurikên xwe tinebûn daku jêra bibin dûnda. Xweda soz da ku wê kurekî bide wî ku jêra bibe dûnda. *Sarayê* cariya xwe ya misirî *Hacer* jêra diyarî kir û rê da ku pêra şû bibe (bizewice). Dema ku *Hacer* ducanî bû êdî pozbilindî li serwera xwe *Sarayê* kir. *Saray* enirî û tore bû, lome û gazinc ji *Ebram* kirin. *Ebram* cariyeya *Sarayê* jêra vegerand û *Sarayê* ew stûxwar û sernixûn kir. *Hacerê* ji wir bazda û çû başûrê erdê Ken'an (Filestînê).

Xweda *Hacer* bi tenha serê xwe nehişt; ferîstekî xwe hinart ku lê bigere. Ferîşt ew li ser bîreka avê li ser rêya "*Şor*" (rojawa û nîveka biyabana Sînayê) dît û jê xwast ku ew vegere ba serwera xwe *Sarayê*, û serweriya wê bipejirîne; jêra got ku zarokê te wê bibe û navê wî wê *Îsmail* (إِسْمَاعِيل) be. *Îsmail* wê mirovekî biyabanî be û senseleta wî wê pir be. *Hacer* vegeriya û *Îsmail* jidayîk bû. Wê hîngê temenê *Ebram* 86 sal bûn⁷.

Çarşemb, 17.02.2016

¹ Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 12, ayet 1 - 3. Abdulhamid Zayed: Rojhilata hemdem, rûpel 421.

² Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 12, ayet 6 - 7.

³ Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 12, ayet 15.

⁴ Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 13, ayet 14 - 16.

⁵ Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 14, ayet 19 - 20.

⁶ Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 15, ayet 18 - 21.

⁷ Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 16, ayet 12.